## Rêkxistina gel û piştîwanîya gel ji şoreşê çima ewqas cem Dr. Qasimlo girîng bûye?

»»» R:6



## Nerîna Dr. Qasimlo li ser xebata netewî û her çar perçên Kurdistanê

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (449) 07-06-2023Buha (1000) Tûmen*

## Girîngiya xebata li ser milê pêşmerge û hebûna hêzekî rêkxistî bi dîtina Dr. Qasimlo

»»» R:4

## Pêxemberê Aştiyê


»»» R:5

# Pûşpera sor

Bo gelê Kurd û bi taybetî PDKÎ û tevgera rizgarîxwaz a Rojhilatê Kurdistanê, meha Pûşperê meheke tijî ji kovane û tijî ji xwîn û qurbanîdan û pêşkêşkirina nirxên mezin ji bona azadiyê û bidest ve anîna mafê netewey ye.

Raste renge di hemî meh û rojên salê de, tu rojek nebe ku xortek yan çendîn xortên xebatkar ên Kurd di rêya xebat ji bona azadiyê pêşkêş nekiribin, lê birîna herî xeda, nirxa herî mezin û giran ji xebatkarên Rojhilatê Kurdistanê û Hizba Demokrat re, renge birîna 34 salan berî niha di meha Pûşperê de be.

Di 22ê Pûşpera 1368an Rojî li hember 13ê Tîrmeha 1989an Zayînî de rêberê mezin û navdar yê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo Sekerterê Giştî yê PDKÎ, di gel Ebdula Qadirî Azer Nûnerê PDKÎ li derveyî welat, li Vîyana paytextê Otrîşê ji aliyê terorîstên hinartî yên rejîma Komara Îslamî ve, kevtne ber desrêja guleyan û hatine şehîd kirin.





Dr. Qasimlo ger ji aliyê rejîma terorîsperwer a Îranê ve hate terorkirin û şehîd bû, ger ji dest dana rêberekî wiha lêzan û siyasetmedarekî mezin û dîplomatekî bê mînak, xisarekî pir mezin bû ji bona gelê Kurd û Hizba Demokrat, lê heya îro rojê jî, Qasimlo bi hizr û nerîn û rêbaz û hêlên siyasî yên ku diyarî kiribûn, di nava gelê xwe de her wisa zindî ye û navê Qasimlo bûye benûştê ser devê heçî azadîxwazekê, hizrên Qasimlo bo xebatkaran bûye çiraya ronahiya rêya xebatê, û raman û nerînên wî rêberê mezin ji bo rêvîngên rêbaza wî re bûne waneyên kar û siyaset meşandinê.

Mezinahiya Dr. Qasimlo, zindî bûna wî, berdewamiya rêbaza wî, ger çi di heyamê 34 salên borî de gelek bi başî ji bo dost û dujminan re eyan bûye, lê me dît ku di şoreşa sala derbasbûyî de anku şoreşa Jînayê de, dirûşma Qasimlo, Qasimlo rêya te dirêjî heye, li nava şeqamên Rojhilatê Kurdistanê çawan tijî qirka xortên şoreşvan û serhildayî ve, dihat bihîstin û guhê deshilatdarên rejîma dîktator û terorîst ker dikir.

Dema ku wisa ye raste dujminê xwînmij û terorîst kariye rêberê mezin bi ceste ji gelê wî û Hizba wî bistîne, lê qet nekariye hizr û nerîn û siyaset û şîret û navê Dr. Qasimlo ji gelê Kurd û rêvîngên Qasimlo bistîne, wate dujmin ne tenê bi terora Qasimlo di armanca xwe de serkevtî nebûye, belku bûye sedem ku heçî xortekî azadîxwaz yê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê xwe rêvîng û dirêjederê rê û rêbaza Dr. Qasimlo bizane, ku ewa jî remza zindî man û hermana Qasimloyê mezin e û heya xortên azadîxwaz ên Kurd mabin dê berdewam bin li ser vê rêbazê û heya serkevtina yekcarî û bidest ve hatina armancên Qasimlo û hemî şehîdên Kurdistanê dest ji vê rêbazê bernadin ku rêberê lêzan û mezin yê me danaye.

# Nerîna Dr. Qasimlo li ser xebata netewî û her çar perçên Kurdistanê



## N: Masûd Tak

**Şehîd Qasimloyê, Ku Min Naskir**
**Ez dixwazim di vê nivisarê xwe da behsa Qasimloyê mirov û Qasimloyê siyasetmedar û qasimloyê, ku min naskiriye û dersên, ku ez ji xebata wî fêr bûme, bikim.**

**

Min navê Qasimloyê nemir di salen 70'î de bihîst. Hingê li Bakurê hişyariyekê netewî ya berfireh di nava xorten Kurdan de hebû. Di behs û gengeşiya me dê navê Qasımlo jî dihat gotin. Lê bi nêzîkî di salen 80'î de min ew naskir.

Tê zanin di sala 1980'an de li Tirkiyê Kudutayê leşkerê çêbû û gelek welatparêz mecbûr man an biçin Kurdistana Rojhilat an jî Kurdistana Rojava, ku ez jî li gel gelek hevalên xwe çûme Kurdistana Rojhilatê. Hingê Piraniya axa Kurdistana Îranê hatibû rizgar kirin û ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Î) ve dihat bi rêva birinê. Hizb himbêza xwe ne tenê bo me, bo hemû tekoşerên Kurd, ku ji ber rejîma leşkerî pena înabûn Kurdistana Îranê vekir.

Ji salên 1981`an vir ve ji ber kar û baran me gelek caran serdana Polît Buroya PDK-Î dikir û carna jî Şehîd Qasimlo ji didît û li gel wî giftûgo û sohbet dikir.

**

Nasname û siyaseta giştî PDK-Î ya îro, berhema xebata Qasimloyê nemîr e.

Wekî eyan e PDK-Î paş ruxana Komara Kurdistan û şehîd kirina Pêşava Qazî û hevalên wî tuşî qeyrana nasnameyî bibû. Gelo PDK-Î beşekê partiya TUDEH e, an jî Partiya Demokrat a Kurdistan (Başur) e?

Di encama kar û xebata Qasimlo û hevalen wî de, PDK-Î bûye partiyekê serbixwe û Kurdistanî. Ango nasnameya zelal bo her rêxistinên siyasî mercê serekî ye.

Dersê dinê, ku ez Qasimloyê nemîr fêr bûme parastina îxtiyara biryara siyasî dayin e.

Zirofê navçe û Kurdistanê, li partiyen Kurd, bi taybetî li partiyên ku xebata çekdarî dikin ferz dike, ku peywendî bi dewletên cîran a dagirker deynin. Ev yeka hanê tiştekê siruştî ye. Lê, tiştek, ku ne siruştî ev e, ku partiyan îxtiyara biryar dayinê bidine destê biyanî û bi gor daxwaza qaşo "dost" tevbigerin.

Şehîd Qasimlo derheqa babeta hanê da digot: "Neyarek ku îro alîkariya te dikin, her dijmin e dost hene, îro alîkariya te nekin jî, her dost in.

"Qasimloyê şehîd hertim digot "partiyên Kurdistanê dikarin li gel dewletên cîran a dagirker, peywendî deynin, lê belê nabe baca peywendiya hanê tevgera azadîxwaza vê perçeyê bide."

Şehîd Qasimlo gelek girîngî dida piştgiriya navnetewî û gelek hewl da, ku hêzên demokrat û azadîxwazên cîhanê palpiştî tevgera azadîxwaza Kurd bin. Di her derfetekê de digot "dijminek pir e, hezar dost kêm e." Digot "divê em hewl bidin neyarên xwe kêm bikin, dostên xwe zêde, ger dost nebin jî, bila bê teref bin an jî nebine neyarê tund."

Dersek, ku ez ji şehîd Qasimlo hîn bûm, derheqa demokrasiyê bû. Hingê ez sosyalîstê tund bûm.

Dîktatoryayê proleterya li ba me ji demokrasiyê herî kamîl û pêşketî baştir bû. Lê belê, gava Şehîd Qasimlo digot "demokrasiya xirab ji dîktatoryaya baş çêtîr e", di destpêkê de min qebûl nedikir û digot çawa tiştê usa dibe? Lê belê, ez hêdî hedî têgihiştim û xebat û dîrok jî nîşan daye, ku şehîd Qasimlo rast e û divê xebat bona demokrasiyê bibe stûnek ji bona xebata azadî û serbestî ye.

Li gel vê yekê Qasimloyê nemîr hertim bo me digot "belê rast e îro li Tirkiyê kuduta hatiye çêkirin rejîmê leşkerî heye.

Lê belê, anegorî Îran Tirkiyê welatekî demokratîk e, berê Tirkiyê li Rojava ye, Tirkiyê dixwaze bibe endama Yekitiya Ewropa. Ev yeka hanê bona tevgera Kurd li Bakurê derfet e. Divê tevgera Kurd ji tund û tijiyê dûr be, girîngî bide xebata demokrasî û dîplomasiyê li Ewropa.



Li ba Qasimloyê şehîd hevkarî û diyaloga partiyên seranserê Kurdistanê gelek girîng bû.

Lê belê, ev her usa bi tundî dijî vê yekê bû, ku parçeyek tedaxulê kar û barên perçeyên dinê bike û xwe li ser parçeyên dinê bisepîne.

Qasimloyê nemîr digot "em hemû ne dostê hevdu ne, em hemû birayê yekdu ne. Meriv dostê xwe hildibijere lê belê nikare birayên xwe hilbijêre."

Qasimlo gelek caran ji bê dengiya bîrûrayê navnetewî aciz dibû gazinda dikir û digot "du dostên me hene: Gelê me û çiyayên me." Lê, Qasimloyê nemîr her usa di warê navnetewî da bona peyda kirina dost û alîkar bo xebata azadiyê, gelek kar kiriye. Îro eger gelek karbidestên dewletên Rojava, serokên partiyên desthilatdar dibêjin,"ne tenê çiya em jî dostê Kurd in". Bê guman bandora xebata Qasimloyê nemîr di gotina hanê mezin e.

Şehîd Qasimlo hertim digot em şer naxwazin, dixwazin pirsa Kurd bi şiklê aşitî û bi rêka diyalogê were çareser kirin. Evê dewlet e, ku bi tank û top êrîşî ser gelê Kurd dike û şerfiroş e. Gelê Kurd bona parastina hebûna xwe, bona parastina welatê xwe mecbûr maye şer bike.

Qasimloyê nemîr digot giftûgo li gel rejîm beşekê girîng a xebata azadiyê ye, mêzê giftûgo jî yek ji meydanên xebatê ye.

Di akamê de pirs, li ser mêzê giftûgo tê çareser kirin, û bi xwe jî li ser mêzê giftûgo hat şehîd kirin, ku ev yeka hanê nîşan dide, ku Qasimloyê nemîr çiqas li ser û boçûnên xwe pêgîr e.

Şehîd Qasimlo li ser bîrûbaweriya çiqas pêgîr bû evqas jî ji tundrewiyê dûr bû, sazişkar nebû sazgar bû.

Bi gor min li gel ew hemû xisusiyetên xwe ve, Qasimloyê nemîr wekî me mîrov bû. Ustureyî nebû ji ezmanê nehatibû. Yên ku gelek bandor li ser min kir, xakî bûna Qasimlo bû.

Qasimloyê nemîr yarîker bû, henek dikir. Rugeş bû, min her tim wî bi rukenî didît. Ji xwe nîşan dayîn (show) dûr bû.

Qasimloyê mirov wekî hemû mirovan ji kêmasiyan xalî nebû.

Gotina Rusan heye, ku dibêjin "helo (Qertal) carna heya musteveya firîna mirîşk nizm difire, lê belê mirîşk çi caran nikare qasê qertal bilind bifire.

Qasimloyê şehîd li esmanê Kurdistanê qertalê berz firîn e û her usa jî bimîne.

# Çima Dr. Qasimlo li ser vê bawerê bû ku, gerçi Kurdistan yek xake û Kurd yek neteweye, lê niha dagîrkaran kirine ٤ perçe, lewra heçî kîjan ji wan perçan gorî taybetmendiya xwe divê xebatê bike û tu perçeyek destêverdanê li perçê din da neket?



N: Mustafa Oziçilik

## Dr.Ebdurehman Qasimlo Rêberekî Têgihiştî, Realîst û Dûrbîn Bû

Sekreterê Giştî yê PDKÎ (Partîya Demokrat a Kurdistan a Îranê) Dr. Ebdurahman Qasimlo di 13ê Tîrmeha 1989an da li Viyeneya paytextê Awûsturyayê, li gel Berpirsyarê Derveyî Welêt yê PDKÎ yê Ebdulla Qadirîzade û Dr.Fazil Resûl ê ji Başûrê Kurdistanê, ji alîyê îstîxbarata Îranê ve di otelê de hatin qetilkirin.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hemû şehîdên Kurdistanê, di têkoşîna hemû şervanên qehreman û kedkarên doza azadîyê de dijîn.

Di 34emîn salvegera şehadeta wan da, em Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî bi rêzdarî bibîr tînin û bi vê minasebetê careke din jî em Dewleta Îranê rûreş dikin.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, sîyasetmedar, rewşenbîr, akademîsyen, mamosta, sosyolog, ekonomîst û dîplomatekî welatperwer bû.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo herweha pêşmerge, fermandar, rêber û serokekî hêja, zana û bi tecrube bû ku, ne bes ji kîsê PDKÎyê, lê belê ji kîsê hemû Kurd û Kurdistanîyên cîhanê çû.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, di bîr û bawerî û sîyaseta xwe da jî mirovekî realîst bû, pêşbîn, dûrbîn bû. Sîyaset û helwesta xwe li gorî konjonktur, şerd û şirûdên welatê xwe, yên dewleta dagirker, dewletên herêmê û cîhanê û her weha li gorî îmkan, hêz û birêxistinbûyîna partîya xwe, ya miletê xwe, ya dijmin û dostên xwe dihûnand.

Kurdistan bêyî îradeya miletê Kurd û gelê Kurdistanê bi çar perçeyan ve hatîye dabeş kirin û dagirkirin. Herçiqas ji nuha ve emê nikaribin şêwe, dem û rêbaza wê dîyar bikin jî; yekitîya miletê Kurd û Kurdistanê mafekî meşrû, neteweyî, niştimanî yê û divê miletê Kurd û gelê Kurdistanê yê her perçeyekî Kurdistanê bi îradeya xwe ya azad di vê derbarê da biryara xwe bide.

Pêşewa Qazî Mihemed digot ''Kurdistan ne çar e, yek e''. Li Meydana Çarçirayê ya Mehabadê da jî, gava Dewleta Komara Kurdistanê hate îlan kirin ji her çar perçeyên Kurdistanê jî nûnerên gelê Kurdistanê hebûn.Piştgirî, alîkarî, hevkarî û lihevxwedîderketina her çar perçeyên Kurdistanê wazîfe û berpirsîyarîyeke neteweyî, niştimanî ye. Lê Pêşewa Qazî Mihemed şerd û şirûdên her perçeyekî Kurdistanê dida ber çavan û li gorî wê, xwest ji wê firsenda dîrokî ya ku hatibû ber derîyê gelê me feydê werbigire û ji Rojhilatê Kurdistanê ve şikestekê li wê zincîra koletîyê û dagirkerîyê bixe.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, li ser rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed û Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê(PDK-Îran) dimeşîya.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, ji alîyekî ve girîngî dida peywendîyên neteweyî, niştimanî yên hêzên Kurd û Kurdistanî yên herçar perçeyên Kurdistanê û Kurdên ku li cîhanê belav bûne; ji alîyekî ve jî ji bo azadîya Rojhilatê Kurdistanê girîngî dida xurt kirin û pêşdebirina partîya xwe û ya hevkarîya partî û rêxistinên Rojhilatê Kurdistanê. Herweha Dr. Ebdulrehman Qasimlo, baş dizanîbû ku, li gorî rastîya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, ji bo azadîya Kurdistanê, ji bo çareserîyeke federalî, pêwîstî bi hevkarî û tifaqeke bi gelên Îranê ra jî heye.

Fikra Dr. Ebdulrehman Qasimlo ya ku digot ''Her perçeyekî Kurdistane divê li gorî taybetmendîyên xwe xebatê bike û divê tu perçeyek destêverdanê li perçê din neke'', encam û berhema têgihiştin, zanîn, berpirsyarî û tecrubeyeke berfireh ya zanistî, sosyolojîk, jeopolîtîk, herêmî, navdewletî, neteweyî û niştimanî bû.

Şerdên her perçeyekî Kurdistanê, birêxistinbûyîn, asta pêşketinê, şêwe û misteweya xebat û têkoşîna her perçeyekî Kurdistanê, helwest û rewşa dagirkerên her perçeyekî û herweha berjewendî û sîyasetên dewletên mezin ên cîhanê, ji bo her perçeyekî Kurdistanê cuda cuda ye. Ji ber wê jî xebat û têkoşîna azadîya her perçeyekî Kurdistanê jî taybetmendiyên xwe hene.

Aşkereye ku di çareserîya pirsa Kurd û Kurdistanê da, sîyaseta dewletên mezin û peywendîyên wan ên bi dewletên dagirkerên Kurdistanê ra, roleke esasî dilihîze; heta gelek caran tayînker e jî. Ev rastîya tesîreke mezin li ser rê, rêbaz û şêweya têkoşîna her perçeyekî Kurdistanê û jî dike, tesîrê li ser şiklê çareserîyê jî dike..

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, ji ber ku rola peywendîyên navnetewî û sîyaseta dewletên mezin ku li ser berjewendîyan hatîye ava kirin baş dizanîbû, girîngîyeke mezin dida dîplomasîyê û xebatên li dîyasporayê. Di qada navnetewî da jî realîst bû, berjewendîyên miletê Kurd esas digirt, peywendîyên xwe bi alîyekî tenê ve teng û sinordar nedikir û karîbû di têkilîyên xwe yên li gel Bloka Rojava û Bloka Rojhilat a cîhanê da balansekê çêbike.

Piştî jenosîda Helebçeyê tevgera neteweyî, niştimanî ya Başûrê Kurdistanê darbeyeke mezin xwarîbû, şikesteke mezin rûda. Lê di sala 1991ê da piştî Sedam Husên Kuweyt dagir kir û Emerîka û hevpeymanên xwe midaxaleyî Iraqê kirin, firsendeke dîrokî û mezin hate ber derîyê gelê me yê Başûrê Kurdistanê; bi raperînê û bi rizgarkirina Hewlêr, Silêmanîye û Dihokê rêya Dewleta Federe ya ku îro heyî vebû.

Heger em rewşa Rojavayê Kurdistanê ya sala 2008ê û ya îro bidin berhevdu, emê bibînin ku, li gorî sîyaseta dewletên mezin di demeke kurt da, dikare rewşa perçeyekî Kurdistanê ji çi astê bigihêje çi astê. Li Rojavayê Kurdistanê partîyên Kurdan wek aktuel behsa qebûl kirina nasnameya Kurdên bê nasnameya Dewleta Sûrîyeyê û behsa mafên ziman û kulturî dikirin; îro behsa rêvebirîyên herêmî, kanton, otonomî, federalî tê kirin.

Herweha li Rojhilatê Kurdistanê, berîya qetil kirina keça Kurd Jîna Emînî, kes ne li bendê bû ku gelê me raperîn û vejîn û helwesteke weha girseyî,neteweyî nîşan bide. Lê çirûskeke biçûk, hêzeke mezin derxist holê.

Ji ber şerdên taybet ên her perçeyekî Kurdistanê, xebat û têkoşîna doza azadîya Kurdistanê jî dê di ast û şêwe û pêvajoyên cuda cuda da derbas bibin. Ji ber vê jî, her perçeyekî Kurdistanê divê li gorî şerdên xwe yên taybet xwe birêxistin bikin; partîyên Kurdistanî, divê berîya her tiştî azadîya wî perçeyê ku lê ne bidin ber xwe û hevkarî, tifaq, bere, platform, kongreyên xwe yên neteweyî, niştimanî li her perçeyekî ava bikin.

Em jî wek PAK(Partîya Azadîya Kurdistanê), rêbaza Dr. Ebdulrehman Qasimlo ya di derbarê birêxistinkirina her perçeyekî Kurdistanê ya li gorî taybetmendîyên xwe, rast û realîst dibînin. Em wek PAK, xwe wek partîyeke Bakurê Kurdistanê pênase dikin.Me azadîya Bakurê Kurdistanê daye ber xwe. Lê belê, herweha em piştgir û alîkarên xuşk û birayên xwe yên Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê ne. Em hemû destkeftîyên wan wek destkeftîyên xwe, hemû xweşî û nexweşîyên wan wek xweşî û nexweşîyên xwe dibînin. Em sîyaseta xwe jî li ser esasê lêxwedîderketin, parastin û piştgirîya hemû destkeftî û têkoşîna wan dihûnin. Ji bo lihevxwedîderketina hêzên azadîxwaz, Kurdistanî yên her çar perçeyên Kurdistanê, em dibêjin divê Navendeke Koordînasyonê hebe da ku em piştgir û alîkarê hev bin, da ku em zerarê nedin hev û da ku em destkeftîyên hev biparêzin, li ziman û kultur û nirxên xwe yên neteweyî, niştimanî xwedî derkevin.

Em wek PAK alîkarî,hevkarî û lihevduxwedîderketina hemû hêzên neteweyî, niştimanî yên her çar parçeyên Kurdistanê diparêzên. Lê aşkereye ku, bingehê alîkarî, hevkarî, lihevxwedîderketin û hevparastinê, ji hevdu qebûl kirinê û lihev rêzgirtinê destpê dibe. Divê hemû partî û rêxistinên Kurdistanî yên li her perçeyekî Kurdistanê, rêzê li partîyên perçeyên din bigirin, midaxaleyên negatîf li wan nekin, xwe li ser tu alîyekî ferz nekin, rêzê li îradeya wan bigirin, têkelî karên wan ên nevxweyî nebin, di peywendîyên xwe yên mecbûrî yên li gel dewletên dagirker da hesasîyetên gelê me yê li wî perçeyî bidin ber çavan, empatîyê bikin.

**Mustafa Ozçelîk**
**Serokê Giştî yê PAKê**

# Kiryar û guherînkariyên herî girîng yên Dr. Qasimlo di nava hizbê de ku bo pêşmergan jî bûne wane



**N:Rostem Cihangîrî**

**Li 34emîn saliya şehîdbûna şehîd Dr.Ebdûrehman Qsimlo rêberê helkevtî yê Rojhelatê Kûrdistan**

Dr.Qasimlo, rêberekî aştîxwaz û bîrmendekî bihizr û bîrên pêşkevtîxwaz bû, kû li dilê gelê kurd li rojhelatê Kurdistanê de bixasimanî li nava dilê xortan de cih girtiye.

Yek ji kiryarên herî girîng û li cihê xwe de bû,ew jî ew bû? Ragihand û kire pirensîpên Partiya Demokrat a Kurdistanê, exlaq têkilî siyaseta hizba xwe kir, û atife û xizmayetî û hevalitî têkilî siyaset û karûbarên partiyê nekir, Hizb li binemale û tayfetiyê derxist, bi girtina kunferans û kongire pesend kirin û xwe tazekirin li van konferas û kongiran li van de bername û pêyrewa naxwe, hilbijartina rêberiyê bi şêweya dengê netenî û hilbijartina sekerterê, Hizb li tak perestiyê rizgar kir, partiyê ,ciwînên rêberî û qirarên komî, yanî qirarên partiyê li dest yek kesda nebû, diviya cema rêberî qirarê bide, ewe bû ku hemû organîzasyûnên Hizbê dihate cî bi cî kirin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê bûye partiyekî herî pêşkevtî, girêdaiy bi yasa û pêrensîpên demokirasî û demokratîke, nek her li Kurdistanê û Îranê, bigere li Rojhilata Navîn de jî. Ew demokratekî rastîn tam bi mana peyvê, bikiryar jî demokirat bû. Rêberek kû rixne û gazinde li xwe û partiya xwe digirt, rixnên dervey partiya xwe jî kû li wî dihat girtin bi dilekî fireh qebol dikir.

Zor kar kir, dakû hevalê hizba xwe fêr bike, da kû li gazinde û rixnan çi li nav partiyê û çi li dervey partiyê netirsin û bi çavê dujminê xwe bi van nenêrin, belkû bi dilekî mezin pêşwazîyê li van bikin û bersivên bi cih bidin, rixnegir dujmin nine, heta kû rixnên van gelek tûnd û neheq jî bin, wî ew kiryar kire pirensîpên heta hetiy yên vê hizbê û bigore bizotneveya rizgarîxwaziy ya gelê kurd li Rojhelatê Kurdistan. Ragihand kû ewên mixalifê siyaset û hizrên me û partiya me ne, nedujminê me ne, tenê ew aliy dujminê mene kû şerê çekdariyê dijî me dikin, ew jî Komara Îslamî ye.

Herwisa em fêr kirin kû li demokirasiyê de hemû tişt bi dilê mirov nabe, lê dibe kû qebûl bikî, eger demokirasî biqazancê te bû qebûl bikî û li cihek din bi qazancê te nebû qebûl nekî?

Ewe bi xwe dibe dîktatorî, îca çi li nava hizbê de be û çi li dervey hizbê be, hingê te ferqek navbera te û dujmin gelê te de namîne, her li vê derheqê de ragihand kû nabe bi tu awayî demokirasî bikeve bin siya xebata netewey, demokrasî esla mesla me ye, nabe bê bin pê kirin. Ragihand xirabitirîn demokrasî, heta kû bigihîje asta anarşîzmê jî? Dîsan demokrasî li baştirîn dîktatoriyê baştir e, îca ew dîktatoriya, Îslamî be an Çepî an jî rast be an jî paşayetî be, feriq nake.

Şehîd Dr.Qasimlo em fêr kirin kû li serkevtinên mezin li xwe bayî nebin û nebêjîn êdî teva ye.

Û li şikan û paşekişandê jî xwe nedûrînên, nebêjin em xilas bûn.

Lewma, hemû gavê rêçare hene, bi fikra komî û mişûr kirinê tev hev dê bikarin bi ser kend û lendande serkevin, û li xwebayî bûnê jî dûr kevin.


Şehîd Dr: Qasimlo li derheq baweriya dîplomasî û têkiliyan de, got li pêş hemû tiştî, em vê yekê bizabin kû li siyasetê de dostayetî û dostê stratijîk heta ser nine?

Ev berjewendîne ,dostayetiyê diyar dike, lê dibe kû hûn vê yekê bizanbin kû em wekî Partiya Demokrat a Kurdistanê dostê stratijîk heta serê heye, ew jî Kurdên parçên din in, kû dostên negurin heta serê ne, heta eger hinek caran berjewendiyên van tev berjewendiyên me hev du negirin û hinek caran jî em hev du bidin û şer jî bikin, lê ew dost û birayên heta hetayne.

Ti carî nahên guherîn, ma bira tên guherîn.

Pêwendiyên me tev dewlet û neyarên Kurd û Kurdistanê nabe ziyanê bigihîjne gelê me yê Kurd, dibe kadir û endamên partiya me hertim vê yekê ber çavên xwe bigirin. Mumkîne me tev dewletekê kû parek Kurdistanê bi destê wî ye hebe, çûnkî jeopolîtîk û cografiyaya Kurdistanê wisa hilkeftiye kû hizb û partîyên van parçan mecbûr bin tev van dewletan pêwendî bigirin, zor asaiy ye, lê nabe bigihîje van cihan kû êdî rêka zivirînê nebe û zîyanê bide gelê Kurd li wê para Kurdistanê, demaku wisa lê hat, ankû zîyan li Kurdên wê parçê kevt, çi bixwazî u nexazî ewa xîyanete kû tu tûş bûyî.

Lewma em dibe ,hertim berjevvndiya gelê kurd biser berjevendiyê hizba xwe bibînin,li hemery devletê dagîrker u her leyeke din siyaseta xwe u serbixweiya xwe bi her nirxekê be biparêzîn.yadin derheq bi gelê xwejî rastgo bîn siyaseta xwe ron û bê perde ji gelê xwe re bêjin, tucaran kiryarên xwe li gelê xwe neveşêrin, eger em tûşî şaştiyekê jî bûbin dibe kû em wê şaştiya xwe qebûl bikin û bi eşkere xwe rixne bikin, eger em vê yekê nekin emê tûşî wê siyasetê bin kû ziyanê bigihîjine berjewendiyên Kurdistanê.



Şehîd Dr:Qasimlo hertim serdana binke û meqerên pêşmergan dikir,tev van di ciwîya,gûhê xwe dida nezer rixne û hizrên pêşmergan,zor bi başî gûhdida van û zor bi hûrî bi zimanekî sade u cûvanî bersiwa van dida,ew nisîhet u rêniwênî dikr, kû tûcara nabe tûşî êhsasatên nebaş bin,reftara pêşmerge dibe twv xelkê me reftara bab kûran be,nabe kiryar û hereketekê bikin kû gelê me dilê wî zede be li me,belkû dibe em gûhê xwe bidin van û nesîhetên gel.

bicidî werbigirin, çûnkî em bo wî gelî xebatê dikin, eger me jî weke dujmin hurmeta van negirt ferqa me û dujmênê me nine, ya din pêşmerge u karrûrên hizbê fêr kirine kû wezîfa pêşmerge tenê şerkirin û kuştina dujmin nine, dibe pêşmerge nimûna başî û çakiyê be li nava gel de, vê demê ye kû gel dê nava dilê xwe de pêşmerge biparêze.

Em fêr kirine kû li meydana şer de,hemû pêşmergeyek dibe ewê bizanibe kû em hizbekî demukratin, parastina mafê mirov wezîfa ser mêlê me hemiyaye, bixasmanî bo girtî û dîlên şer dibe mafê van zor bi başî biparêzin û siyasetên me bo van ron bikin û saxûselîm li meydana şer dûr bikin û paşan bên azad kirin, çi dibe bila bibe, me şehîd dabin an na, dibe dîlên şer bên azad kirin.qanûnên nawdevletê yên mafê dîlê şer li perwerda pêşmerge u kadruyên hizbê dihat gutin u fêrkirin.

Her ew siyast u dersên wî Rêberê mebu ku li pêwendiyê derkî çi tev dojminên kurdistanê u çi li tew her dewlet u hizbekê partiya Demukirat a kurdistana îranê tûşî tu xiyaneteke neteweiy nebo,seba wê hinedê ye cihê wî li rih u canê gelê xwede girtiy.pratiya wîjî heta nihajî be her li ser wê siyasetê didume.

**Ders û rêniwênîyên wî rêberê bêhempa gelek in, kû dibe bên gotin bên nivîsandin, lê derfeta wê nivîsê her ewqas daye, hêvî dikim kû li gotarên nivîsên hevalên din de bê behs kirin.**

**Silav li riha pak a hemû şehîdên Kurdistanê.**

**Silav bo riha şehîd Dr:Ebdûrehman Qasimlo yê mezin.**

# Pêxemberê Aştiyê



**N: Selîm Zencîrî**

Bi dilek xemîn û tejî kul û keser ve em ber bi 34'mîn salvegera terorkirina rêberê navdar ê xwe ''Dr. Qasimlo''ve diçin ku ji aliyê rejîma terorîstî ya Îslamî ya Îranê ve li ser maseya got û bêjê hat terorkirin. Bîranîna han di demekê de ye ku cîhan û dever bi giştî û Îran jî bi taybetî ketiye nava guhertinên mezin, û valahiya nebûna rêberekî karîzmatîk û siyasetvakekî realîst û pragmatîk wekî Dr. Qasimlo pitir ji her demekê xuya dike.

Terorek trajedîk ku dilê neteweyek mafxwarî û azadîxwaz ê weke gelê Kurd û bi taybetî dilê rêberekî ku ji bo aştî û demokrasiyê lê dixist, bi armanc girt û mixabin heta niha jî, şûnwarên nerênî ên rewanî, siyasî û civakî ên wê terorê li ser cism û rewanê gelê Kurd û tevgera azadîxwazî û demokrasîxwaziya Îran û Kurdistanê xuya ye.

Trajedîktir ji bûyera terorê, pêknehatina dadgehek dadperwerane û cezadana biryarder û encamderên wê terorê ye ku dide selimandin berjewendiyên abûrî û têkiliyên siyasî li cîhana modern ya îroyîn de li serweyî mafên mirov û buhayên însanî, exlaqî û demokratîk in. Buha û baweriyên ku Dr. Qasimlo di jiyana xwe ya siyasî de nirxek mezin li bicihkirina wan de da. Baweriyên ku di wê serdem û şert û mercê de bêmînak bûn.

Cuda ji terora fîzîkî, mixabin rejîma hov û terorîstî ya Îranê û herweha rikeberên siyasî ên Dr. Qasimlo jî, cehdek zêde ji bo berxwarkirina rastiyên jiyan, bawerî û pirensîpên wî dan, û bi propagendeyên jehrî û mezaxtina têçûyên mezin bo reşkirina kesatî û baweriyên Qasimloyê Kurdan, dîsan jî nekarîn wî û çirayên rêbaza pir ji serwerî a wî di nava gelê Kurd de bitemirînin. Rêbazek ku li bin tîrêjên hikmet, zanayî, raman û baweriyên bilind ên mirovî û demokratîk ên Dr. Qasimlo bihêz bû û bi deryayek ji xwîna xebatkar û şopînerên vê rêbazê, bûye bi mektebek ji bo perwerdehiyê û navnîşanek xurt ji bo parastina nasname û berheqiya doza gelê Kurd. Perwerdeyek ku girîngiyek zêde li ba Dr. Qasimlo hebû û berdewam tekez dikir ku ''azadî, proseyek hînbûnê a dijwar û demdirêj e ku li dijwartirîn şert û mercan de jî, nabe armancên giştî ên xebatê, bibin bi goriyê taktîkên demkî. Çi armancek, çiqas bedev be jî, nabe bibe pasaw bo bikarbirina her alavekê''.

Li ser vê bingehê jî, Qasimlo weke pirensîp ji tund û tûjiyê bêzar bû û di vê baweriyê de bû ku ''rêçareya pirsa kurd, ne leşkirî ye!

Û renge em nekarin serkevtinê bidest bixin, lê dujmin jî nikare me ji holê rake''. Lewre rêçareyên aştîxwazane û rêketin, bi ser şerê malwêranker de tercîh dida.

Wî digot: ''Pirsa kurd aloz e û madam ku dostên me kêm in, hewce ye em ji hejmara dujminên xwe jî kêm bikin. Belê, di Rojhilata Navîn de hevokek nav û deng heye ku ''Dujminê dujminê me, dostê me ye''. Ew yek jî bibû sedem ku li cem rexnegiran bi reformîst, û li cem rikeberan bi sazişkar û li cem dijberan jî heta bi xiyanetkar were dîtin.

Tekoşînên Dr. Qasimlo ji bo çareseriya aştiyane a pirsa kurd bû sebeb ku propagendeyên dujminan bi nîşandana rûçikek şerxwaz ji kurdan heya qasekê lawaz bibe. Rast li vê biyavê de, rejîma terorîstî a îslamî a Îranê kete dek û dolaban û bi danîna kumpiloyek qirêj li jêr navê got û bêjê de, mixabin ew şehîd kirin.

Dr. Qasimlo tevî wê ku bi başî rejîma dîktator û xwînmij a Îslamî a Îranê dinasî û herweha şîreta bavê xwe jî ''Yan ji fend û fêlên deshilata Îranê bireve yan jî wan bikuje'' bi bîr mabû, lê nedikarî dest ji baweriyên xwe ên aştîxwazane bikşîne.

Sînorên baweriyên aştîxwazane ên wî tenê li Îran û Rojhilata Kurdistanê de berteng nedibûn, belkî ji bo parçeyên din ên Kurdistanê jî reng vedida.

Cehd û tekoşînên wî ji bo berevanîkirin û navbeynkariya li navbera kurdên başûr û rejîma Beis û çareseriya aştiyane a pirsa Kurd de xuya û berçav bûn. Kurdên ku ji aliyê rejîma Beis a Îraqê ve bi ''Seyîd el muxeribîn'', anku serdesteyên xirabkaran''



dihatin dîtin, bi cehda Dr. Qasimlo û hizrên aştîxwazane ên wî li ser maseya gotûbêjan bi hevre rûniştin û bo midehekê diyalog û hewlên çareseriyê bal bi ser şer û malwêraniyê de kişand.

Dr. Qasimlo berdewam tekez kiriye ku şanaziya herî mezin a wî, ew e ku kariye armancên tevgera xwe ji riya kiryarên rojane ên tevgera xwe ve bi xelkê bide nasandin.

Lewre terorîzm û tund û tûjî li cem Qasimlo, du mijarên nefretlêkirî bûne û nehişt ku tevgera gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê bi pêşengiya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bikeve bin bandora hêzên terorîstî, û dest bo karê teqîn û bombedanîn li nava bazar û cihên giştî, balafirdizîn, rehîngirtin, îşkencedan yan kuştina êxsîr û xelkê bêguneh û sivîlan û…hwd bibe. Wî ji şidetê hez nedikir, lê berpirsatiya kiryarên leşkirî ên tevgerê ku di çarçoveya berevaniya rewa de bûn, bi stû digirt.

Dr. Qasimlo, demokratek rastîn bû û baweriyek kûr bi demokrasî, bihevre jiyana aştiyane hebû.

Li ser vê bingehê jî, ''demokrasî bi dujminê hejmar yek a terorîzmê dizanî û digot li cihê ku demokrasî hebe, teror geşe nake''.
Dr. Qasimlo di got û bêjek bi rojnameya ''Lîbrasiyon'' a wê demê re dabû zanîn ''Buhaya bo demokrasiyê, em didin, lê bi kêmî li ser me tê gotin û kêmtir dibine mijara ragihandinan. Lê gurûpek terorîstî bi rehîngirtin û bombedanînê di seranserî cîhanê de bi nav û deng dibe''.

Aliyê kêm du nimûneyên rehîngirtinê hene ku bi cehd û navbeynkariya Hizba Demokrat bi rêbertiya Dr. Qasimlo hatin serbestberdan. Yek ji wan, çend Firansî bûn ku ji aliyê Partiya Komonîst a Îraqê (beşa leşkirî) ve hatibûn rehîngirtin û li ser daxwaza fermî a Wezareta Derve ya Firansayê ji Hizba Demokrat, ew rehîn li hember pereyekê ku Hizba Demokrat bi xwe mezaxt, serbest hatin berdan. Ya din jî çend Îtalî bûn ku ji aliyê YNK' ve hatibûn rehînkirin.

Ramanên mirovî û aştîxwazane, nefreta ji tund û tûjiyê û berpirsatiya li hember pêşeroja gel û civakê, Qasimlo û rêbaza wî di qada Kurdistanê de zindî hişt û nehişt ku teror û terorperwerî bibe beşek ji perwerdeya xebatê. Wî berdewam tekez kiriye ku ''me li hember pêşeroja civakê de berpirsatî heye û em nikarin bi fikr û ramanên qirêj, civakek saxlem ava bikin, ger em jî reftarên dujminan dubare bikin, çi ciyawaziyek li navbera me û wan de namîne''.

Şermezarkirin kiryarên terorîstî li cem Dr. Qasimlo, him pirensîp, him metodek perwerdehiyê di xebatê de û him jî vebijêrkek exlaqî û siyasî bû.

Mehkûmkirina rehîngirtina karmendên balyozxaneya Amerîka li Tehranê ji aliyê rejîma îslamî a Îranê ji helwestên dîrokî ên partiya Qasimlo ye ku li wî serdemî de kêmwêne bû û bi hebûna van sedem û zaf sebebên din, ji xwe re nine ku nasnavê ''Pêxemberê Aştiyê'' li Dr. Qasimlo kirine. Pêxemberek, mêrxasek, rêberek û pêşmergeyek bo hertim di dilê gelê xwe û hemû azadîxwazan de bi zindî dimîne.

Lê teror û terorperwerî di rejîmên terorîstî ên weke Komara Îslamî a Îranê de ku alavek bingehîn û rewa ye bona pêşvebirina armancên siyasî, weke eslek neguher bi awayek sîstematîk birêve diçe, û bazara rehîngirin, reşekujî û dîktatoriyê jî têde tê xurtkirin, ji bilî nefret û kîna zêdetir a xelkê Îran û deverê, û herweha coşdana hesta xebat û dijberiya ji bo avêtina di kirsdanka dîrokê de ku çarenivîsa hemû zalim û dîktatoran e, tiştek din li pey nahê. Bêguman ew roj, nizîk e.

# Rêkxistina gel û piştîwanîya gel ji şoreşê çima ewqas cem Dr. Qasimlo girîng bûye?



**N: Kawe Deştebêlî**

**Dîtina Dr. Qasimlo Lidor Girîngîya Beşdarbûna Gel Di Şoreşê de**

Kêm kes hene nebihîstbin ku Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberek lêhatî û lêzan bûye, lê renge her kes nezane ka çima Dr. Qasimlo bi wan sîfetan hatîye naskirin. Têgeh û ramanên Dr. Ebdulrehman Qasimlo di hemî warên jîyanê de xasma, û rênîşander bûn.

Wek rêberek hêja û xewedî navûbang, Dr. Qasimlo serkêşî û pêşengîyek zanistî, serdemî, û serkevtî ya şoreşa gelê Kurd dikir. Di warê hizrî û teorî de, di warê sîyasî û dîplomasî de, di warê, kargêrî û rêveberî de, di warê exlaq û prensîpên şoreşgêrî de, bandora Dr. Qasimlo li ser şoreşa gelê Kurd her dem xuyaye.

Dîtina Dr. Qasimlo li ser şoreşa rizgarîxwazî ya gelê Kurd, mîna gelek hizr û dîtinên wî, ji felsefe û têgehiştina wî ji bo jîyan û azadîyê serkanî digirt. Berwajî gelek rêber û serkirdeyên serdemên berî xwe, Dr. Qasimlo di şoreş û serhildana serdemî ya gelê Kurd de xwe bi mihwer ne didît û bi tenê li ser qaweta xwe, êl û eşîret û xelkê derdorê xwe hisêb nedikir. Wî azadî û rizgarîya bi wate tinê di azadî û serbestîya gel de didît; li ber wê yekê jî bi gel re dijîya û bo gel dijîya û bi gel re xebat dikir.

Li gor bawirîya Dr. Qasimlo, gel her dem yekimîn jêdera hêzê bûye û dida dîyar kirin ku ger gel were rêkxistin, dikare hemî asteng û alengarîyên ser rêya xebatê ramale û azadî û serbestîya xwe berdest bike.

Dr. Qasimlo bawirîyek mokim bi demokrasîyê hebû û wek mamostayê demokrasîyê jî ev rastîye ji her kesî baştir dizanî ku deselat û hêza gel bingeh û sitûna sereke ya demokrasîyê ye.

Dr. Qaimlo baş dizanî ku heya gişt tex û çînên civaka Kurdî neyên dîtin, neyên rêkxistin û neyên beşdarkirin, ne şoreşa rizgarîyê ser dikeve, ne demokrasî ava dibe, û ne tu serkevtin dikarin dom bikin.

Her li ber rohnîya vê dîtinê, wî girîngiyek berçav dabû rêkxistin, rol û beşdarîya jinan, lawan, xwendekaran û hemî texên din yên civakê û



pêdagirî li ser avakirina sazî û sendîkayan dikir, û her dem kar dikir ji bo rakêşana piştîwanîya gel.

Dr. Qasimlo ne tenê şehrezayê mêjûya gelên din yên cîhanê û şoreşên rizgarîxwazîya neteweyên din bû, zanîyariyek kûr û têgehiştinek zelal li ser dîroka gelê Kurd û şoreşên serdemên berî xwe hebû û baş dizanî ku yêk ji egerên şikest yan serneketina şoreşên berê, bandora hizra kesî, eşîretî, olî, û nedana girîngîyê bi rêkxistina gel û beşdarkirina gel bûye di alîyên cihê yên xebatê de. Axifitin, gotar, û berhemên Dr. Qasimlo ku niha berdest in tijî mînakên vê rastîyê ne.

Girîngîdana bi rêkxistana gel û rakêşana piştîwanîya gel tenê di hizr û ramanên Dr. Qasimlo de sînordar neman. Wî bi kiryar ev hizr di nav refên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de kir beşek ji pilan kar û xebata çalakvanên vê parîya sîyasî.

Hizba Demokrat heya di qonaxên sext û dijwar de jî pêwendîyn gerim yên hizrî û yên rêkxistinî bi gel re parastine û berfireh kirine, û berhemên vê raman û sîyaseta dirust jî niha pêtir ji her demek din dikeve ber çav. Îro li Rojhelatê Kurdistanê, gelê Kurd ne tenê piştîwanek mezin yê Hizb û xebatkarên xwe ye, belkû wê bûye mekîne û pêşengê vê qonaxa şoreş û berxwedanê li Îran û Kurdistanê.

Di van salên dawî de, bi taybetî di Şoreşa Jin, Jîyan, Azadî de, girîngîya wan hizr û bîrên rêberê Şehîd Dr. Qasimlo gelek bi zelalî ketin ber çav.

Di xwepêşandanan de, di mangirtinan de, di derbirîna hizr û daxwazên xwe de, gelê Kurd li Rojhelatê Kurdistanê pêtir ji hemê gelên din yên Îranê bi rêkxistin, bi bandor, û serkevtî bûye.

Piştîvanîya gelê Kurd bo Hizba Demokrat, û hizbên din yên Kurd, her wisa bersivdana wî gelî bi bangewaz û daxwazên hizb û rêberên xwe yên sîyasî, di vê yek sala borî de, meydan li rejîma Komara Îslamî teng kirîye.

**Di 34emîn salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo, hezaran silav li riha wî ya paqij û serkevtin jibo rêwîngên rêya wî.**


# Jiyannameya muzîkjenê Kurd yê Xelkê Xorasana Bakur, rehmetî Xan Mihemed Adînepûr

Kurdê Xorasanê Xan Mihemed Adînepûr mamoste û pêşengê cîhana muzîka meqamî û jenyarê xwedî şiyan yê amûrên weke Qoşme, Kemançe û Dutarê bû. Di asata navneteweyî de xwediyê çendîn pile û xelatên navdar di festîvalên mûzîka Îranê de bû.

Xan Mihemed di sala 1952'an de li bajarokê Xanleq a girêdayî bajarê Şîrwan a ser bi parêzgeha Xorasana Bakur hatibû dinê. Zêdetirî ji 60 salan jiyana xwe ji bo jenîn û pêşkêşkirina mûzîka resen a kirmancî terxan kiribû û di vê rê de jî gelek berhemên bi nirx afirandin û gelek stranên gelêrî jî ji windabûnê rizgar kirin.

Ev amûra Qoşme di kombûn û dawetan de tê bikaranîn û li Rojhilatê Kurdistanê bi navê Duzele tê naskirin. Di nav kurdên Xorasanê de bi navê Qoşme tê naskirin û li piraniya bajarên bakurê Xorasanê ev amûra han heye, û amûreke resen a Kurdî ye. Xan Mihemed weha behsa amûra xwe kiriye:


Quşma ku ez dijenim ev nêzî 60 salan e di nav tiliyên min de ye û di hemû bername, kombûn û dawetan de bi min re bûye û ew amûra han ji perrên Bazê hatiye çêkirin û bo zelqandina bi yektir a perçên vê ji curek zelqokê mifah hatiye wergirtin ku ji hêsirên çavên Xezalê berhem tê, ji ber vê jî deng û çîpîna vê bi tevahî sirûştiye û



pêkhatiya awaza nav sirûştê ye.

Mamoste Xan Mihemed roja Duşemê 12ê Pûşpera 2723an Kurdî an 3.7.2023an koça dawî kir, û bo heta hetayê xatir li Qoşme û mûzîkjeniyê xwest, lê nav û deng û hunera Xan Mihemed wê heta hetayê di nav gel, nîştiman û hezkirên wî de bo bîranînan bimîne.

## Nerîna Lîderan




**“Xalid Ezîzî:”**

Em di rewşa niha de gelê Otrîşê, parlemento û partiyên vî welatî di dosyeya terorkirina Dr. Qsimlo de tawanbar nizanin, lê dewleta wê demê tawanbar e.



**“Joe Biden”:**

Divê em hewl bidin ku demokrasiyê xurt bikin.



**“ William Burns :”**

Êrîşa Rûsyayê ya li ser Ukraynayê ji bo me derfetek e; Moskova wê qelstir bibe û bibe koloniya Çînê.



**“Recep Tayyip Erdogan:”**

“Tirkiye qebûl nake ku Swêd bibe endamê NATOyê, heta ku ew welat dev ji wan komên ku Enqere van terorîst dihesibîne rawestîne.”

# Qasimlû, mîratgirê Komara Kurdistanê Hizb vejand!



**N: Eskender Ceiferî**

**Roja 22’ê Pûşperê salvegera têrorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlû ji aliyê têrorîstên rêjîma faşîstên Tehranê ve ye.**

**Dr. Qasimlû, heman kesatî bû ku piştî herifîna Komara Kurdistanê, Hizba Dêmokrat vejand.**

Roja 22’ê Kanûna Paşîn a sala 1946’an a Zayînî angu 2’ê Rêbendanê a sala 1324’an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira li bajarê Mehabadê yê Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdistanê hilda. Di vê rêwresmê de Qazî Mihemed wiha sûnd xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sûndê diwxem heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim.”

Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vê dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûye şanaziya Kurdan.

Komar hate herifandin, lê Qasimlû, ji wargeha Simkoyê Şikak nehêla çeper vala bimîne û ew avedan ragirt.

Beriya Komara Kurdistanê jî li vê navçeyê, serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak çê bibûn.

Piştî ku sala 1941’ê rêjîma Şayê Farsan, Riza Şa bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza bû desthilatdarê rêjîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku ji Kurdistanê hatibûn dûrxistin , zivirîn Kurdistanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bigirin destên xwe.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin desthilata Kurd û Azerbaycaniyan de û Rûsî jî derbasî navçeyê bibûn.

Sala 1942’an li Mahabadê kovara bi navê Nîştiman bi beşdarbûna 11 kesan hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û li ser hesta netewî ya Kurdan kar dikir. Navê vê komeleyê dihate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945’an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Hizba Dêmokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, serxwebûn, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din bûn.

Ji bilî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şex Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdistanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû ezmûneke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û yên din kiribûn mînak û waneya berxwedanê ji wan hîn bibûn.

Piştî ku di 22’ê Kanûna Paşîn a1946’an Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê angu Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevlî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.

Komara Kurdistanê ya ku li Mehabadê bi Serokkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, çarde wezîr jî lixwe digirtin ku ev in; Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Muînî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlxanîzade, Wezîrê Şer û Parastinê: Seyf Qazî, Wezîrê Darayiyê: Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê: Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan: Îsmaîl Îlxanîzade, Wezîrê Ragihandinê: Sidîq Heyderî, Wezîrê Post, Telefon û Telegrafê: Kerîm Ehmedeyn, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê: Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar: Xelîl Xûsrevî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê: Hecî Mistefa Dawûdî, Wezîrê Tenduristiyê: Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê: Mehmûd Welîzade. Wan wezîran, yasaya Komarê zelal kirin.

Hizba Dêmokrat, niha mîratgira yekemîn komara dêmokratîk li Rojhilata Navîn e.

Di dema yazde mehên temenê Komara Kurdistanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî, civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo parastina mafên jinan jî hatin pêkanîn, çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ, ji mîratên Komara Kurdistanê ne ku heya îro jî li dijî dagirkar xebatê dike.

Aboriya Komara Kurdistanê li ser bac û ticaretê birêve diçû bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir.

Herwisa Komara Kurdistanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi dest xwe ve bîne.

Hêzên Rêjîma Şayê Farsan, bi desteka Brîtanyayê di roja 17’ê Kanûna 1946’an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdistanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir.

Ji bilî desteka Brîtanya, Sovyetê jî bi Îranê re lihev kiribû ku pêwendiyên wan ên aborî bi rêjîma Şayê Farsan re berdewam bikin û di lihevhatina wan de hatibû destnîşankirin ku “Mijarên Azerbaycan û Kurdistanê, pirsgirêkên navxwe ne û Îran divê bixwe, van pirsgirêkan çareser bike û êdî Sovyet pişta van neyarên Îranê nagire. Herwisa êdî hêzên Sovyetê û ên Brîtanya jî, ji axa Îranê bi temamî vedikişiyan.”

Di roja 31’ê Adarê a sala 1947’an a Zayînî de Qazî Mihemed serokkomarê Kurdistanê, Seyf Qazî wezîrê Şer û Parastinê yê Komarê û birayê wî Sedr Qazî li meydana Çarçira ya Mehabadê

hatin darvekirin lê rêbaz û çepera wan, heya niha jî her didome û bûye şanaziya Kurdan.

Piştî dawîhatina Komarê û darvekirina Qazî, xema giran, berdewamkirina vê dozê bû ku ji aliyê nifşa nû ve wate ji aliyê kesên wek şehîd Dr. Qasimlû ve hate domandin û gihaye destên me.

# Divê ev şoreşa çi bi dest bixe?



N: Aso Mênberî
W: Hesen Mukerem



Dema ku zordarî di civakê de belav dibe û bandorê li aliyên cuda yên jiyana takekesî dike, gava yekem a civakê nîşandana nerazîbûna xwe ye, nerazîbûna li hember rewşa heyî ye, da ku rayedaran bide bawerkirin ku ev reftar xelet e û pêwîstî bi guhertineke cidî heye.

Wirda ye ku berdewamiya reftarên rejîmê di dema borî de, dê bibe sedem ku gel û civak bêdeng nebin û vê carê xwenîşandan derbasî qonaxeke tundtir bibin, heta vê astê ku bikarin şoreşekê bi şêweya tevgereke girseyî ya bihêz pêk bînin.

Bi rastî jî guhnedana daxwazên civakê ji aliyê desthilatdariyê ve û ne hewldana ji bo çareserkirina pirsgirêkên sereke yên civakê, wê neçar dike ku helwestê nîşan bidin, ji ber vê yekê jî katalîzatora sereke ya şoreşê kiryarên desthilatdariyê bi xwe ye.
Dibe ku di her civakekê de zordestî bi awayekî cuda xwe nîşan bide, di civakekê de, zordestiya li ser komek ol, etnîk, çand û heta nijadî ji ya din zêdetir dibe, lewma reaksiyona van koman li hember desthilatê û rola wan di şoreş û xwenîşandanan de dibe ku cûdahiyek bingehîn hebe.

Eger em li bûyerên çend mehên borî yên Îran û Kurdistanê mêze bikin, em hinek cudahiyan dibînin.

Jîngeha Kurdistanê jîngeheke cuda ye, Kurdistan herêmeke dagîrkirî ye û ji ber wê jî pirsgirêka neteweyî di vê erdnîgariyê de xwedî girîngiyeke taybet e, her ev girîngiya han wisa kiriye ku rewşenbîrî û fêmkirina xelkê di pirsan de kûr bibe.

Û di heqîqetê de, rûyê heqîqî yê bûyeran mêze bikin û di heman demê de jî reaksyonên cuda hene û ji aliyek din ve jî wisa kiriye ku helwesta desthilatdaran a li hemberî vê erdnîgariyê her tim cuda bûye.

Lewma, zordariya ku rejîm li ser civakê bi giştî dimeşîne li Kurdistanê gelek cudatir û radîkaltir e û ji ber wê jî şerê li dijî Kurdistanê dê ji erdnîgariya mayî gelek cudatir be.

Heger li bajarên Îranê pirsgirêka sereke ya xelkê aborî û hîcaba bi zorê ye, heman pirsgirêk li Kurdistanê jî ji ber derbasiya xwe ya siyasî gelek radîkaltir e, heta wê astê ku dibe sedema paşveçûna aborî li Kurdistanê yan jî li paytexta Îranê keçekê dikuje! Lê, Şoreşa Jînayê ku li dijî rewşa niha ya Îranê û li dijî rejîma deshilatdar a Komara Îslamî ya Îranê nerazîbûneke mezin bû, divê ber bi kuderê ve here? An jî divê ew çi tiştekê li pey xwe bîne? Nayê înkarkirin ku di van salên dawî de di nav civaka Îranê de xwenîşandan hebûne, lê bi kêmanî di 10 salên borî de em dikarin bêjin ku xwîşandan tundtir bûne.

Ji ber ku xelkê bi temamî nasnameya rejîmê û mohra sereke ya rejîmê bi xwe, wek Xamineyî, kiribûn armanca xwe, ji aliyekî din ve, zêdetir giştgîrtir bûn, ji ber ku hemû beşên civakê li hev kom kiribûn. Ji ber vê yekê, em fêm dikin ku hêza li vê erdnîgariyê, heke ne ji sedî 100 wek yek be, lê belê, heta astekê li hember tevahiya xelkê zordarî meşandiye, çi li Kurdistanê ji ber nerînên siyasî û çi li Belûçistanê ji ber cudahiyên olî, û ev zordariya zêdetir û hevdem serkutkarî jî berfirehtir bûye.

Pirsgirêkên jinan û cudahî, pirsgirêkên civaka pişk zêrîn, pirsgirêkên kedkar, ciwan, xwendekar, mamoste, komên etnîk û beşên din ên civakê, ew di nav civaka Îranê de hem hatiye çewisandin û hem jî hatiye tepeserkirin, lewma di şoreşa Jînayê de hemû bi hev re daketin şeqaman û li dijî vê zilmê rawestiyan.

Şoreşa Jînayê qîrîna hemû girûpên navborî bû, lewma karî ji hemû xwenîşandanên din ên dîroka Komara Îslamî bi awayeke berfirehtir tevahiya rejîmê bike armanc û tirsa hilweşandinê di dilê rejîmê de bihêle. Tişta ku di Şoreşa Jînayê de diyar bû, derketina jinê bû, ji ber vê yekê ger şoreşa Jînayê di vê qonaxê de encamên ku me dixwestin bi dest nexistibe û şoreş vemire, divê di mijara jinan de guhertinên girîng çê bibin.

Jinan di vê şoreşê de rolek aktîf lîstin, berevajî salên berê ku jin li malê rûdiniştin û heta tavlî şoreşên girseyî nedibûn û nîşandana nerizayetiyê erka zilaman hesab dikirin, di vê şoreşê de jinan nîşan da ku têgihîştin û daxwaza wan a ji bo pirsgirêkan bilind e û vê yekê ji mafê xwe dibînin. Di serkeftina her cure şoreş û têkoşînekê de bi civakê re gavan dihavêjin.

Ger em Şoreşa Jînayê wekî ezmûnek bibînin, xuya dibe ku jin dikare di karûbarên civakî û siyasî de rolek aktîf bilîze, ji ber ku beşdarbûna jinên pêşeng di tevgera Kurdistanê de di van deh salên borî de îspat kiriye ku ew ji erkên xwe yên heqîqî û mafê sirûştî yên xwe ku beşdariya çalakane di pirsên civakê de dûr ketine.

Jinan di vê şoreşê de roleke erênî lîstin, lewma divê rewşa wan bi awayekî erênî biguhere, ev şoreş encam çi dibe bila bibe, beriya her tiştî divê di rewşa jinê de guhertinek pêk bîne û jin bigihîje azadiya xwe ya takekesî.

Rol û pêgeha xuya û bandor hebe û hema ku wisa ye Şoreşa Jînayê divê wek xaleke guherîn di jiyana siyasî û civakî û heta aboriya jinan de bê dîtin û hewl bidin da ku tevî hemû astengiyan derfetên zêdetir û meydanên berfirehtir bidin bi jinê.
Lê, ya girîngtir ew e ku jin bi xwe jî dikarin gavên mezintir bavêjin û ji bo bidestxistina rewşa xwe ya rast xwe perwerde bikin û têkoşînê bimeşînin.

## Rêveberiya Xweser îro 11 koçberên li peravên Cezayirê xeniqîbûn vedigerîne

Rêveberiya Xweser îro 11 koçberên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê yên ku li peravên Cezayîrê xeniqî bûn vedigerîne.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di derbarê vegerandina termên 11 koçberan de daxuyaniyek belav kir û got, Nivîsgeha Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ji bo vegerandina termên 11 welatiyên Rojavayê Kurdistanê û Sûrî ku di 5ê Hezîrana borî de can dabûn, hemû rêkarên pêwîst amade kirine.

Di daxuyaniyê de hat eşkerekirin, di nav wan 11 kesên xeniqîbûn de 3 zarok jî hene.

Rêveberiya Xweser eşkere kir, wê roja Pênceşmê 6ê Tîrmehê de termê 11 qubaniyan bigihêje balafirgeha Beyrûtê ya Libnanê û ji wir ber bi Sûriyê ve bên şandin.

Herwiha Rêveberiya Xweser ji ber alîkariyên bo veguhestina cenazeyan de spasiya Xaçar Sor a Libnanê û Heyva Sor a Sûriyê kir.

Herwiha Rêveberiya Xweser sersaxiyê ji malbatên qurbaniyan re xwest û bang kir ku xelkê herêmê li peya planên qaçaxçiyan neçin ku ew jî di berjewendiya “dijminên gelê me de ku herêmê ji ciwanan vala bike. Em bang li şênî û ciwanên xwe dikin, bi xaka xwe ve girêdayî bin û em zehmetiyên pêvajoya rastî herêmê û Sûriyê bi giştî tê, baş nas dikin.”

Navên wan 11 qurbaniyên di daxuyaniyê de hatin eşkerekirin ev in: Azad Şiyar Xelî, Şiyar Mihemed Xelîl, Cemîle Ebdulbaqî Mihemed Elî, Mesûd Mistefa Mihemed, Ula Ebdulrezaq El-Ehmed, Larîn Mesûd Mihemed, Emîre Mihemed Hebeş, Helîme Mihemed Mistefa, Ferman Edîb Dalî, Yasmîn Cewdet Seidî, Ehmed Bekir Kîko.

# Aliyê din yê ku exlaqê desthilatê birê ve dibe



N: Vênûs Fayq
W: Hesen Mukerem

Yek ji pirsên ku feylesofan heta niha bersiveke kêrhatî jê re nedîtine, pirsa exlaqê ye, exlaq di wateya giştî de, çi kirin rast e û nekirin çi xelet e, ji ber ku di dawiyê de hemî nerîn nisbî ne û bawerî ji mirovekê bo mirovek din diguher e, pêver, argyûment, şirove û bawerî di guherînkariya berdewam de ne.

Lê, dûr ji vê bersiva ku feylesof li dû digerin, komek norm û nirxên însanî yên cihgîr hene ku dikarin gelek bi zelalî başî û xirabiyê pêka vê pêver bikin û di mijareke weke "exlaqê birêvebirinê" de bikin bi bingeh..

Ti demî "exlaqê bikom" di gel "exlaqê takan" du tiştên ji hev cuda nebûne, tak koma ava dikin û çemkên komî ava dikin.

Bi vê wateyê ev girûpa ku desthilat heye civakekê birêve dibe, ya ku encam dide tiştek nine ku ji nû ve hînî bibe, eger baş be an xirab.

Çimkî ev desthilata birêveber e ku di nav sîstemeke exlaqî de çalak e, koma exlaqane ku take mirovên vê koma mirovan desthilat pêk anîn e.

**Mîkavîlî ku bavê avakerê "Exlaqê siyasî" tê hesibandin li ser vê baweriyê ye ku "dibe hewce be serkirdeyekî siyasî van kiryaran encam bide ku renge eger wekî mirovekî asayî encam bide şaş be."**

Lê,piştire di demokrasiya serdemiyane de ji vê hizrê hûr bibe û du cure exlaq hebin pêka cih û pêgeha xwe peyrevî ji van bike, eger tu miroveke baş bî serkirdeyekî baş dibî, lê eger wekî însanekî xwediyê dîroka xirab bî, heman exlaqî di hunrî jiyana siyasî û desthilatdariyê de berhem tînî.

Bêrtirand Rasil pirs dike: "Gelo dibe ji milê exlaq ve ji vê yekê razî bin ku civakek emrekê birê ve dibe, hemû tiştên baş taybet bin bi etnîkên di hunrî vê civakê de, û ji serdestê daxwaz bê kirin bi vê ku ya vê kêmtir e razî bibe?"

Ev pirsa mezintirîn pirsgirêka exlaqî dirust dike, Rasl dibêje: "Her ji ber vê yekê ye jî di gel vê hemû navdariya ku heye, pirtûka "exlaq" ti biha û girîngiyek tuneye."

Ez daxwaz nakim ku mirovên siyasî pirtûkan bixwînin, û feylesofan nas bikin, çimkî ji vê yekê re dereng e, lê ya ku dikarin bi hêsanî bikar bînin, aliyê kêm ya "exlaq" ji hev cuda kirin, baş û xirab e, ku wirda dikarin her sîstemeke desthilatdariyê pê pênase bikin, ku gelo ev desthilata ku di şaneyên xwe de cih gîr kirine başe an xirabe?

Xwe nabe "exlaq" bibe sedemeke feyde gihandinê, ku bi qezenca me bû em peyrevî jê bikin û demaku di berjewendiyên me de nebû vêde bibin. Diruste ku siyaset hunera mumkinan e, lê her kiryareke siyasiya desthilatdarekê bingeheke exlaqî ya takekesî heye.

**Eflatûn dibêje: "Zilamê baş welatiyekî baş e, û nabe li ciheke din be bilî li himbêza dewleteke baş de, çimkî nabe behs ji exlaqê takekesî ya desthilatdarekî bi tenê di berjewendiyên giştî de bikin."**

**Ev yeka ye ku exlaq û siyaset di hundrî hev du de cih digrin û pirsên siyasî û**




**mijarên exlaqî tevlî yektir dikin, çimkî ti carî ji hev du qut nebûne.**

Bi çend peyvên din, her serkirdeyek ku berjewendiyên takekesiyên xwe an girûpeke biçûk ya nêzî xwe li serweyî berjewendiyên zêde yên xelkê dît, vê demê exlaqê siyasî pênaseke din ji xwe digire.

Û serkirdeyek di ne îdaletiyekê de, eger di eniya yasayê de be jî, bê deng bû, vê demê ev exlaqê siyasî yê wî serkirdeyî baweriya xwe ji dest dide.

Çimkî şert nine hemû ev pirsên ku dibin bi yasa, îdalet li hundr de hebin, lê hemû pirsekê aliyeke exlaqî heye ku dibe wisa bi hêsanî neyên bidest xistin.

# Di meha Hezîranê de Bakurê Kuridstanê 22 jin hatin qetilkirin

Kujtina jinan li Tirkîyê pirsgirêkek bi serê xwe ye. Meh namîne ku bi dehan jin neyên kujtin û qetilkirin.

Li gor rapora KCDP, di meha Hezîranê de 22 jin hatin qetilkirin, 27 jin jî bi guman mirine.

Platforma Em ê Kujtina Jinan Rawestînin (KCDP) daneyên xwe yên meha Hezîranê yên di derbarê şiddeta mêran de parve kir. Li gor raporê, mêran di meha Hezîranê de 22 jin kuştine, 27 jin jî bi guman mirine.

Bîlançoya meha Hezîranê

Li gor raporê, ji 22 jinan 6 kes ji ber ku dixwestin di derbarê jiyana xwe de biryarên wek redkirina hevberdanê, lihevhatinê, zewacê û têkilîyan bidin, hatine qetilkirin. 2 jin bi hinceta aborî û 1 jî bi hinceta xwedîderketina li zaroka xwe hatin qetilkirin. Di raporê de nehatiye zanîn ku 13 jin bi çi hincetê hatine qetilkirin. Sedema qetilkirina 13 jinan nehat zelalkirin. Di raporê de hat gotin ku, "Nediyarkirina hinceta ku 13 jin hatine kuştin, di encama tundîya li ser jinan û nexuyakirina kuştina jinan e. Heta ku neyê diyarkirin jin ji alîyê kê ve û çima hatine kuştin, darizandinek adil neyê kirin, bersûc û kujer neyên cezakirin û tedbîrên pêşîgirtinê neyên girtin, wê tundî her ku biçe mezin bibe".

Di raporê de hat diyarkirin ku di meha Hezîranê de ji sedî 41ê jinan ji alîyê mêrên xwe yên zewicî ve hatine qetilkirin.

Di vê mehê de ji sedî 55ê jinên ku hatine qetilkirin li malê hatine kujtin, ji



sedî 55ê van jinan bi çekê hatine kujtin.
Di mirina jinan de guman zêdebûn KCDPê di derbarê mirina bi guman a 27 jinan de jî ev daxuyanî bi kar anî: "Wek ku me di raporên xwe de diyar kiribû, mirina jinan a bi guman wek xwekuştin an mirina xwezayî tên nîşandan û di hejmara jinan de zêdebûnek pir cidî heye.

Kujtinên bi guman ên jinan, mixabin ji kuştinên jinan jî dijwartir in. Divê bê eşkerekirin ka jin hatine kuştin, bi rastî bi qezayê mirine, jin li ser bingeha zayendî hatine kuştin (gelo jinkujî ye), întîxar kirine yan tiştekî din e".

## Komîteya Asayîş û Berevaniyê ya Kongresa Amerîkayê bendek li ser guhertina Wezareta Berevaniyê ya sala 2024ê zêde kir û tê de daxwaz kir ku sîstema berevaniya asmanî ji Hêzên Pêşmerge re bê dayîn.

**N: Kofîxwar**

Di 21ê Hezîrena 20223an de roja Çarşemê Komîteya Xizmetguzarî ya Civata Kongresê ya Amerîkayê ji bo Herêma Kurdistanê parastina li hember êrîşên firokeyên bê firokevan û mûşekî yên welatên cîran werbigire biryar da.Endamê Kongresê yê Komarî Don Bacon ji Meclisa Nûneran a Amerîkayê pêşniyar kir ku li dijî êrîşên balafirên bêmirov û mûşekî sîstema berevaniya hewayî ji Hêzên Pêşmerge re bê dayîn. Bacon li ser Twitterê amaje bi wê yekê kir ku mebesta vê pêşnûmeyê ew e ku "alîkariya kurdên Herêma Kurdistanê li hember berdewamiya êrîşên mûşekî û firokeyên bê firokevan ên Îranê bibin xwedî berevaniya esmanî ya baştir.

Dengdana wê,di dema nîqaşkirina Qanûna Destûrnameya Parastina Neteweyî ya di sala 2024an de(NDAA),qanûnek salane ya ku budceya Pentagonê destnîşan dike,hate girtin.Guhertinek cuda di pêşnûmeya NDAA ya Meclîsa Nûneran de "berfirehkirina alîkariya darayî ji komên sûrî û hêzên hevbeş re ji bo şerê li dijî DAIŞê"dide.

Di medyaya Iraqê de nûçeyên navdewletî hatin belavkirin ku Komîteya Asayiş û Berevaniyê ya Kongreya Amerîkayê bendek li ser sererastkirina yasaya bûdceya sala 2024ê ya Wezareta Berevaniyê zêde kir û tê de daxwaza dabînkirina sîstema berevaniya esmanî bo Hêzên Pêşmerge kir.

Jonathan Lord, serokê bernameya ewlekariya Rojhilata Navîn li Navenda Ewlekariya Nû ya Amerîkî, ji Middle East Eye (MEE) re ( saziya nûçeyên navenda li Londonê )got;"Daxwaza pergalên berevaniya esmanî yên Amerîkî pir zêde ye.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê herêmek e ku cebilxane, mûşekên balîstîk û rokêtên Îranê yên bêserûber tehdîd dikin,ew cihek e ku dixwaze karînên xwe yên berevaniyê bihêz bike".Herweha li gorî nûçeya MEE, hat gotin ku pêşnûme ji aliyê her du partiyên Amerîkayê piştgirîyeke xurt wergirtiye û dê rêveberiya Amerîkayê ji bo Pêşmergeyên Kurdistanê planên perwerdebûyîna sîstemên berevaniya esmanî û xweparastinê çalakiyan yên li dijî êrîşên Îranê yên wek mûşek, roket û firokeyên bêmirov û hêzên amede bike.

Li ser wê dîsa gorî nûçeya di Sarku'l Avsat ji ajansa ANAyê ya Qahîreyê de;di gotara Komîteya Ewlekarî û Berevaniyê ya Kongresa Amerîkayê de,li dijî mûşekên Îranê yên ku Hewlêra paytext ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin armanc,dê sîstemên berevaniya esmanî ji Hêzên Pêşmerge re bê dayîn,hat gotin.

Generalê berê Ernest Audern jî ji K24ê re ragihand,Herêma Kurdistanê hevpeymanê sereke yê Amerîkayê ye û niha pêwîstiya wê bi sîstema berevaniya asmanî heye û di bin metirsiya Îranê û hêzên nêzîkî wê de ye.Auderno bal kişande ser wê yekê ku Pentagon dikare bi du awayan sîstema berevaniya esmanî bişîne Herêma Kurdistanê, Auderno got, "Rêya yekem ew e ku perwerdeya sîstema berevaniya esmanî bide Hêzên Pêşmerge û rêya duyem jî ew e ku Amerîka bi xwe sîstemê kontrol bike".

Auderno got, "Ez ji sedî sed piştgiriyê didim şandina sîstema parastina hewayî ya Herêma Kurdistanê."

Endamê berê yê Kongresê yê Amerîkî Trent Franks ragihand,"Heger Senato pesend bike;serokê Amerîka Joe Biden dê radestkirina sîstema berevaniya asmanî bo Herêma Kurdistanê red nake."

Berdevkê berê yê Hevpeymaniya Navdewletî ya dijî DAIŞê kolberê xanenişîn Myles Caggins ragihand ku" Amerîka hewl dide êrişên mûşekî yên li ser Herêma Herêma Kurdistanê û bi taybet êrişên Îranê rawestîne û Washington dê hewl bide di qonaxa yekem de fonên têra xwe terxan bike û dê dabîn bike".

Di vî warî de hewldanên rêveberiya Hewlêrê ku gelek hewl dan li aliyê DYA'yê encam dan.Di êrîşên Îlona 2022an de hat kirin de sivîl jî di nav de zêdeyî 50 kes birîndar bûn û 18 kes mirin.Dîsa di êrîşa nîvê şevê ya bi mûşekên balîstîk ên ser Hewlêrê de, ku 12ê Adarê bi 13ê Adarê ve girêdabû, ziyaneke madî ya mezin li malên derdorê bi taybet xaniya kasibkarê kurd Şêx Baz Kerîm rû da û 2 welatiyên sivîl birîndar bûn.Ev tenê du nimûne ne ku di destpêkê de tênê bîra me.

Bi dehan êrîşên bi heman rengî pêk hatin, zêdeyî 100 kes mirin û bi sedan kes jî birîndar bûn.Îdîaya rêveberiya Tehranê ya ku êrîş pêk anîne ew e ku IKB mazûvaniya îstîxbarata Îsraîlê û komên cudaxwaz dike.Hewldanên rêveberiya Hewlêrê encam dan IKB ne tenê di bin êrîşên Îranê de ma.Heşda Şeibî ku milîseke çekdar a Iraqê ye ku bi nêzîkbûna xwe ya ji Îranê re tê naskirin, êrişî gelek xalan bi taybet firokexaneya navdewletî ya Hewlêrê jî kir.Rêveberiya Hewlêrê bi hinceta ku jiyana sivîlan dixe metirsiyê, gelek caran bang li civaka navneteweyî kir ku sîstema parastina hewayî peyda bike.

Şêwirmendê Leşkerî yê Serekanê berê yê Iraqê û Serokê Giştî yê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî Babekir Zêbarî ragihand ku "Amerîka dê sîstema berevaniya asmanî bide Hêzên Pêşmerge". Zêbarî di 23ê Hezîranê de li ser malpera fermî ya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) bi serokatiya Mesûd Barzanî,"kdp.info"nirxand û derbarê dabînkirina sîstema berevaniya esmanî ya Amerîkayê bo Hêzên Pêşmerge de, nirxandinek kir.Medyaya rojava.Zêbarî dabînkirina sîstema berevaniya esmanî ya Amerîkayê ji bo Pêşmerge bi pêşketineke girîng wesif kir û got,"Dê metirsiya êrişa dijmin ya li ser Herêma Kurdistanê ji holê rabe, ji ber ku Herêma Kurdistanê bi berdewamî di pozîsyona berevaniyê de ye, ne êrîşkar e." Zêbarî bal kişand ser wê yekê ku ji bo Pêşmerge ew sîstem mafê xwezayî ye û got,"Tti kes nikare pêşiya vê yekê bigire û rê li proseyê bigire".

Zêbarî got,"Înîsiyatîfa (ji bo pergala parastina hewayî) dewam dike.

Eger biryarek ji aliyê DYA'yê ve bê girtin, wê rasterast bikeve qonaxa bi cî anîn e.

Ji ber ku biryara ku girtine rasterast bi cih tînin.Ji ber vê yekê dê Ji ber vê yekê dê ji bo Hêzên Pêşmerge sîstema parastina hewayî bê dayin."

**Dê li benda hewldanên bicîanîna vê biryarê ne.**

**Bi hêviya serkeftinê.**



# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Newsûd: Ji ber gulebarana hêzên leşkerî yên dewletê çavê kolberek birîndar bû

Roja Sêşemî 13’ê Pûşperê kolberekê bi navê “Heman Mehmûdî” xelkê gundê “Kanî Reş” a ser bi Selas Bawecanî ji ber gulleyên hêzên hikûmetê li ser sînorê Newsûdê ji aliyê çavê xwe ve bi giranî birîndar bû.

Hêzên leşkerî yên dewletê bi bê hişyariya berê rasterast gule li wî kolberî reşandin û  çav û gelek cihên laşê wî bi giranî birîndar bûn.

Bi sedema giraniya birînan, ev kolber bo çareseriya pizîşkî bo nexweşxaneya Farabî ya Tehranê hate veguhastin.

## Sine; Muxtar Mênberî piştî danîna barimteyê hat berdan

Roja Sêşemî 13’ê Tîrmehê, Muxtar Mênberî  welatiyê gundê “Niyer” a bajarê Sinê piştî danîna barimteya 500 milyon Tûmenî, bi awayekî demkî ji girtîgeha vî bajarî hat azadkirin.

Li gor çavkaniyeke ku ji Kurdpa yê re ragehandiye, ev welatiyê han danê sibê roja Sêşemî 13’ê Pûşperê, piştî bidawîhatina proseya lêpirsînê bo girtîgeha îtla`ata Sinê hatiye veguhastin.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Mênberî di heyama binçavkirinê de ji mafê hebûna parêzerekî diyarkirî û hevdîtina bi malbata xwe re bê par bûye.

Roja Duşemî 8`ê Cozerdanê, Muxtar Mênberî yê kurê Sabir bi bê pêşkêşkirina belgeya dadgehê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibû binçavkirin.

Heta niha derbarê sedema binçavkirin û tohmetbarkirina vî welatiyê Kurd de ti zanyariyên berfireh bi dest neketin.

## Li Mehabadê binçavkirina ciwanekî Kurd ji aliyê hêzên ewlehiyê ve

Roja Yekşemî 28ê Cozerdanê welatiyekî Kurd ê bi navê “Seyd Ehmed Talane” temen 28 salî û kurê Seyîd Rehîm xelkê Mehabadê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar, ev ciwan, han bi bê pêşkêşkirina belgeya dadgehê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve li nêzîkî mala xwe hatiye binçavkirin û bo cihekî nediyar hatiye veguhastin.

Vê çavkaniya agehdar her wiha got: Heta niha şopandina malbata Seyîd Ehmed Talane ji bo zanîna çarenivîsa wî bê encam bûye.

Heya dema belav kirina vê nûçeyê, ti zanyariyek derbarê sedema binçavkirin û tohmetên li ser vî ciwanê Kurd nîne.

## Redkirina biryara pêragihîştin bi dadgeha mamosta Arman Sadiqî li dadgeha Hemdanê

civîna cezayê destpêkî ya mamosta Arman Sadiqî, pêşminêjî Înê yê gundê “Husênî” a bajarê Dêwolanê û rêveber û mamostayê Darululûma Mihemed Resûlullah Dêwolanê, li dadgeha pêdaçûna taybet a Rûhaniyet a bajarê Hemedanê hat redkirin.

Li gora nûçeya gihîştî bi Kurdpayê, roja Şemî 10’ê Pûşperê, di pêwendiyeke telefonî ya dadgeha pêdaçûna Taybet a Rûhaniya Hemedan de, jî wî meleyê Kurd re hat ragihandin ku biryarên derbarê wî de bi dawî bûn û nerazîbûn nayê qebolkirin û dosyeya wî bo bicihanîna biryaran hate şandin.

Mamoste Arman Sadiqî bi îdiaya “propagandaya li dijî nizamên” û “tevlîhevkirina hizra giştî” ji aliyê Dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê ve cezayê 7 meh û nîv heps, 74 qamçî û qedexekirina li xwekirina kincên melayan ji navbirî re hate birîn.

Roja Sêşemî 8’ê Xezelwer a 1401’an, mamosta Arman Sadiqî, pêşnimêjê înê yê gundê “Husênî” a ser bi bajarê Dêwolanê, li dadgeha Taybet a Rûhaniyet ya bajarê Hemedanê hate tohmetbarkirin û bi danîna barimteyê hat berdan.

Ev meleyê Kurd piştî piştgirî dayîna serhildana şoreşgerî ya Jin, Jiyan, Azadî, bo dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hate gazîkirin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (449)